

Nirxandinek Li Ser Pirtûka The Kurds a Thomas Bois¹: Naverok, Girîngî û Pêbawerî

Thomas Bois'in Kürtler Adlı Kitabının İncelenmesi: İçerik, Önem ve Güvenilirlik.

A review of Thomas Bois's book The Kurds: Content, Importance, and Reliability

Nuh BOZKUR

<https://orcid.org/0000-0002-0178-2812> | nuhbozkur7@gmail.com

Xwendekarê Doktorayê, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtûya Zimanên Zindî yên Li Tirkîyeyê, Beşa ziman û Çanda Kurdî, Mardin, Tirkîye.

ROR ID: <https://ror.org/0396cd675>

Jêgir Citation Atıf	Bozkur, N. (2025). Nirxandinek li ser pirtûka the kurds a Thomas Bois: naverok, girîngî û pêbawerî. <i>Artuklu Kurdology</i> (20) 67 -73
Dîroka Şandinê Submission Date Geliş tarihi	16.08.2025
Dîroka Qebûlê Acceptance Date Kabul Tarihi	28.09.2025
Dîroka Weşandinê Publication Date Yayın tarihi	30.09.2025
Cureyê Gotarê Article Type Makale Türü	Nirxandina pirtûkan Book review Kitap değerlendirmesi
Hakemî Peer-Review Hakemlik	Nirxandinên pirtûkan nayên hakemkirin. Ew ji aliyê edîtorê qadê û edîtorên zimanî v etene kontrolkirin. <i>Book reviews are not sent to reviewers. They are checked by section editor and language editors.</i> Kitap değerlendirmeleri hakemlere gönderilmez. Sadece alan editörü ve dil editörlerinin kontrolünde yayımlanır.
Beyana Etîk Ethical Statement Etik Beyanı	Hatîye beyankirin ku di pêkanî û nivîsina vê xebatê de hemû rêzikên zanistî û etîk hatine şopandin û hemû çavkanî bi awayekî têkûz hatine referanskirin. Ragihandina Etîkê: jms@artuklu.edu.tr . <i>It is declared that scientific and ethical principles have been followed while carrying out and writing this study and that all the sources used have been properly cited.</i> Ethical notification: jms@artuklu.edu.tr Bu çalîşma yapîlîrken ve yazîlîrken bilimsel ve etîk ilkelere uyulduđu ve kullanîlan tüm kaynaklara uygun şekilde atıfta bulunulduđu beyan edilir. Etik Bildirim: jms@artuklu.edu.tr
Kontrola İntihalê Plagiarism Checks Benzerlik Kontrolü	Belê – İntihal.net Yes – İntihal.net Evet – İntihal.net
Nakokiyên Berjewendiyan Conflicts of Interest Çıkar Çatışması	Di gotarê de di navbera nivîskar û ti aliyên din nakokîya berjewendiyê tune ye. <i>There is no conflict of interest between the author and any parties in the article.</i> Yazar ile makalede yer alan taraflar arasında herhangi bir çıkar çatışması bulunmamaktadır.
Alîkarîya Darayî Grant Support Maddi Destek	Nivîskar beyan dike ku wan wî ji bo vê vekolînê ti fonên derveyî wernegirtine. <i>The author(s) acknowledge that they received no external funding in support of this research.</i> Yazar(lar), bu araştırmayı desteklemek için herhangi bir dış fon almadıklarını kabul etmektedirler.

1 Wergera Kurtejiyana Thomas Bois ya di pirtûkê de; “Keşe Thomas Bois di sala 1900 de li Dunkirkê ji dayîk bûye û di sala 1919 de ketiye tariqeta Domînîkî. Di sala 1927 de ew şandine Rojhilata Navîn û ji wê demê ve ye ew li wir dimîne. Li wir xwendina Erebi, Sureth û Kurdî kiriye. Ji destpêkê ve wî eleqeyê taybet nişanê gelê Kurd da û li ser ziman, wêje, dîrok, kevneşopî û dinê vî gelê kêmnas gotar weşandin. Wî gelek nêrînan li ser kovarên rojhilatnasyîyê zêde kiriye, di nav de van de “Les Cahiers de l’Est” û “Al-Machriq” ya Beyrûtê, “Proche-Orient Chretien” ya Orşelîmê, “Bibliotheca Orientalis” ya Leyden, û “L’Afrique et l’”. “Asieetl’Orient” ya Parisê jî heye. Pirtûka “Kurd” senteza van hemû weşanan e.

Polîtîkaya Hişê Çêkirî <i>AI Policy</i> Yapay Zeka Politikası	Nivîskar beyan dîkin ku di nivîsîna gotarê de alîkarîya HÇ wernegiritiye. <i>The author(s) declares that they have not used AI in producing this paper.</i> Yazar(lar) bu makalenin yazımı aşamasına YZ kullanmadıklarını beyan eder.
Mafê Telifê & Destûr <i>Copyright & License</i> Telif Hakkı & Lisanslama	Nivîskar li jer lîsansa CC BY-NC 4.0 mafê xwe yê li ser xebata xwe diparêzin. <i>Authors publishing in the journal retain the copyright to their work licensed under the CC BY-NC 4.0.</i> Dergide yayın yapan yazarlar, CC BY-NC 4.0 kapsamında lisanslanan çalışmalarının telif haklarını saklı tutarlar.
Agahîyên Îndeksan <i>Indexing</i> Dizinleme Bilgisi	DOAJ, MLA, ErihPlus, Linguistic Bibliography, EBSCO, ProQuest

Kurte

Beşeke mezin yê Kurdologên biyanî keşe û mîsyonerên xiristiyan in. Thomas Bois jî yek ji van kesan e. Bois, wekî keşeyek û Rojhilatnasek li Rojhilata Navîn maye û karê mîsyoneriyê kiriye. Li ser kurdan xebatên wî yê berfireh hene. Di pirtûka xwe ya bi navê *The Kurds* de di 11 beşan de derbarê kurdan de gelek agahî dane ku li gorî Bois ev pirtûk ji bo danasîna gelê kurd hatiye nivîsîn. Ligel ku ev pirtûk bi awayekî orjînal bi frensî wekî *Di derbarê Kurdan de Agahî* (Connaissance des Kurdes) hatibe çapkirin jî me ji wergera îngilîzî ya bi navê *The Kurds* ji aliyê naverok, giringî û pêbawerîya akademîk ve nirxand. Di encamê de me dît ku serenav û naverokên pirtûkê hev digire, her çiqas bi sempatiyeke li hemberî kurdan nivîsandibe jî ji aliyê çavkanî, referans û dizayna *Participant observation* a xebatên etnografîk çavkaniyeke pêbawer e. Herwiha bi hin rexneyên xwe yê li ser romana kurdî û sedemên kêmbûna bikaranîna kurdî û tespîtên li ser hêmanên folklorîk yê kurdan rê li ber hin xebatên akademîk jî vedike.

Peyvên Sereke: Kurdolojî, Rojhilatnasî, Kurd, Thomas Bois, Mîsyoner

Xalên Sereke

Pirtûka bi navê *The Kurds* ji hemû xebatên Rojhilatnas Thomas Bois ya li ser kurdan pêk hatiye.

Di pirtûka xwe ya bi navê *The Kurds* de di 11 beşan de derbarê kurdan de gelek agahî dane ku li gorî Bois ev pirtûk ji bo danasîna gelê kurd hatiye nivîsîn.

Di derbarê bawerî, rîtuêl û baweriyên batil agahiyên berfireh dane. Ji vî aliyê ve pirtûk ji bo xwînerê û lêkolînerên kurdolojiyê him qadeke fireh him jî bi **îdîa** û tesbîtên xwe qadên lêkolînê jî destnîşan dike.

Abstract

A significant portion of foreign Kurdologists are Christian priests and missionaries. Thomas Bois is one of these Kurdologists. Bois lived in the Middle East as a priest and orientalist and carried out missionary activities. Bois, who has extensive studies on the Kurds, is also the author of the book “Kurds”, which provides extensive information about the Kurds, consisting of 11 chapters, which he states were written to introduce the Kurdish people. Although this book was initially published in French under the title *Connaissance des Kurdes*, we evaluated its English translation under the title “The Kurds” in terms of content, importance and academic reliability. As a result, it was seen that the title and content of the book were consistent, and although it was written with sympathy for the Kurds, the source, reference and ethnographic studies were a reliable source with the Participant Observation design. It also opens the door to academic studies with its criticisms of Kurdish novels, the reasons for

the decline in the use of Kurdish, and its findings on Kurdish folkloric elements.

Keywords: Kurdology, Orientalism, The Kurds, Thomas Bois, missionaries.

Highlights

The Kurds book is a compilation of Orientalist Thomas Bois's complete works on the Kurds.

In his book, The Kurds, Bois provides extensive information about the Kurds in 11 chapters designed to introduce the Kurdish people.

He provides comprehensive information on beliefs, rituals, and superstitions. In this context, the book offers a broad scope for both readers and researchers of Kurdish studies and points to areas of research with its arguments and findings.

Öz

Yabancı Kürdologların önemli bir kısmını Hristiyan rahipler ve misyonerler oluşturmaktadır. Thomas Bois de bu Kürdologlardan biridir. Bois, bir rahip ve oryantalist olarak Ortadoğu'da yaşamış ve misyonerlik faaliyetlerinde bulunmuştur. Kürtler konusunda kapsamlı çalışmaları olan Bois, Kürt halkını tanıtmak amacıyla yazıldığını belirttiği 11 bölümden oluşan ve Kürtler hakkında geniş bilgi veren *The Kurds* adlı kitabın da yazarıdır. Bu kitap başlangıçta Fransızca, *Kürtler Hakkında Bilgi* (Connaissance des Kurdes) ismiyle yayınlanmış olsa da, *Kürtler* başlığıyla İngilizce çevirisini içerik, önem ve akademik güvenilirlik açısından değerlendirdik. Sonuç olarak kitabın başlığı ve içeriğinin tutarlı olduğu, Kürtlere yönelik sempatiyle yazılmış olmasına rağmen kaynak, referans ve etnografik çalışmaların Katılımcı Gözlem tasarımı ile güvenilir bir kaynak olduğu görülmüştür. Aynı zaman da Kürtçe romana yönelik eleştirileri, Kürtçenin kullanımının azalmasının nedenleri, Kürt folklorik unsurlarına ilişkin tespitleriyle akademik çalışmalara da kapı aralıyor.

Anahtar Kelimeler: Kurdoloji, Oryantalizm, Kürtler, Thomas Bois, Misyonerler.

Öne Çıkanlar

Kürtler kitabı, Oryantalist Thomas Bois'in Kürtler üzerine yazdığı tüm eserlerin bir derlemesidir.

Bois, Kürtler adlı kitabında, Kürt halkını tanıtmak amacıyla kaleme aldığı 11 bölümde Kürtler hakkında geniş bilgiler sunmaktadır.

İnançlar, ritüeller ve batıl inançlar hakkında kapsamlı bilgiler sunmaktadır. Bu bağlamda kitap, hem Kürt çalışmaları okuyucuları ve araştırmacıları için geniş bir alan sunmakta hem de iddiaları ve bulgularıyla araştırma alanlarına işaret etmektedir.

Destpêk

Xebatên derbarê kurdan de ku em wan wekî xebatên kurdolojiyê dinirxînin, bi armanca nasîn û danasîna ziman, çand, wêje (devkî-nivîskî) û folklora kurdan hatine nivîsîn. Ji ber ku kurd gelek caran rastî înkâr û îmhayê tî çavkaniyên derve yê derbarê kurdolojiyê jî wekî çavkaniyên girîng derdikevin pêşîya me. Akin (2013, r.42) dema nivîskarên rêzimana kurdî lêkolîn dike ew di sê kategoriyan de wekî misyoner, efser û mîltanên kurd dabeş dike. Dema ku em li çavkaniyên derveyên yê derbarê kurdan de dinêrin, em jî dikarin wan di heman sê (3) kategoriyan de dabeş bikin. Kategoriya yekem *kurd* bi xwe ne. Û em dikarin mînakên Şerefxanê Bedlîsî û M. Mehmûdê Bazîdî, Celadet Elî Bedirxan nîşan bidin. Kategoriya duyem, *efser û konsolos* in ku li cihên wekî Erzirom, Musil û Urmiyê hatine tayînkirin, A. Jaba, B. Nikitin û Mînorsky, R. Lescot mînakên baş yê vê kategoriye ne. Kategoriya sêyem, *misyoner* in ku ev bi taybetî keşe û alim û kesayetên dînî yê xiristîyaniyê ne, M. Garzoni (1734-1809), mîlakeke hêja yê vê kategoriye ye ku Bois (1966, r.79) wî wekî *bavê kurdolojiyê* bi nav dike. Nivîskarê Pirtûka “Kurd” ku mijara nirxandinê ye, Thomas Bois (1900-1975) jî di kategoriya sêyem de cih digire.

Pirtûk ji aliyê keşe Thomas Bois ve di sala 1965an de hatiye nivisandin, orjînalê Pirtûkê frensî ye û navê pirtûkê ya orjînal *Di derbarê Kurdan de Agahî* (Connaissance des Kurdes) ye. Lê belê pirtûka li ber destê me wergera wê ya îngilîzî ye ku di sala 1966an de ji aliyê Professor M.W.M. Welland ve li Beyrûdê hatiye çapkirin. Ev di wergera îngilîzî de tenê wekî *The Kurds* hatiye binavkirin. Em dikarin navê orjînal ya pirtûkê li gorî ya wergerê dilnizmtir binirxînin. Tê dîtin ku her çiqas bingeheên vê pirtûkê çavdêriyên Bois hatiye danîn jî Bois ji gelek çavkaniyan sûd wergirtiye. Bois di 11 beşan de di derbarê kurdan de agahiyên cur be cur daye. Di pêşgotina pirtûkê de nivîskar destnîşan dike ku armanca vê pirtûkê berfirehkirina zanyariyên di derbarê kurdan de ye ku baş nayêne zanîn û bi gelemperî nayên famkirin. Û herwiha ev pêşgotin di derbarê naverokê de jî agahiyên di nav xwe de dihevine. Di heman demê de kurtejiya Bois ya di dawîya pirtûkê de tê destnîşankirin ku ev pirtûk sênteza gelek xebat û gotarên Bois ne ku di derbarê kurdan de nivisandine. Armanca vê nirxandinê jî danasîna vê pirtûkê ya ji aliyê naverok, giringî, û pêbaweriya pirtûkê ye.

1. Naveroka Pirtûkê

Ku em bi awayeke lez li pirtûkê binêrin, li ser cilda pirtûkê wêneyekî dibînin ku mirov fam dike, wêneyê gundek e. Di wêneyê de çend xaniyên ax yê li derûdorê mizgeftê civiyane nîşan dide. Ev cild him di orjînalê pirtûkê de him jî di wergera îngilîzî de hatiye bikaranîn. Piştî ku cild tê vekirin mirov rastî pêşgotinekê tê ku bi devê keseke sêyem hatiye nivisandin û tê de derbarê kurdan, armanca nivisandina pirtûkê û pirtûkê de agahî hene. Di du rûpelên pêş de di derbarê cih û sala çapê, navê wergêr cih digire. Û rûpelên piştê jî beşeke naverokê heye. Di dawîya pirtûkê de em rastî du cure bîbliyografiyan tînin ku di listeya bîbliyografiya yekemîn de nivîskar Bois, hin pirtûk û gotarên derbarê beşên pirtûkê de pêşniyar dike. Di listeya bîbliyografiya duyemîn de çavkaniyên nivîskar yê di pirtûkê de hatine destnîşankirin. Di piştê cildê pirtûkê de jî bi wêneyê nivîskar Thomas Bois re kurtejiyanekî wî hatiye pêşkeşkirin.

Pirtûk bi giştî ji 11 beşan pêk tê. Beşa yekemîn bi sernavê “Kurdistan” nivîskar hewl daye ku di derbarê ernîgarî, çavkaniyên aborî û gund û bajarên welatê kurdan de agahî bide. Dema vê jî dike sînoren siyasî yê wê serdemê nabîne. Beşa duyemîn bi sernavê “Li pey Şopa Gelê Kurd”² li ser orjîn û kokên kurdan hatiye rawestîn. Ji efsane û mîtan herwiha jî dîrok, antropolojî û arkeolojiyê gelek argûman hatiye pêşkeşkirin (di heman demê de hin piştraskirinên lîngûîstîk jî hatiye rawestîn). Beşa sêyemîn bi navê “Jiyan di nav Kurdan de” derdikeve pêşberî me. Di vê beşê de di derbarê jiyanê koçerî û gundîbûna an jî niştecîhbûna kurdan de agahiyên berfireh hene, xanî û konên kurdan tînin

2 In Search of the Kurdish People

şayesandin û derbarê xebat û jiyana rojane ya kurdan de agahî û çavdêriyên xwe pêşkeş kirine. Beşa çaremîn a pirtûkê bi sernavê “Pergala Civakî” dertê pêşiya me. Bois di bin vê sernavê de hewl dide ku pergala civakî ya kurd bide nasîn. Di vê beşê de jî helbet ji eşîrên kurdan û pergala eşîrtiyê behs dike, xwerêvebirina kurdan a bi awayekî siyasî, derketina mîrektî, axatî û begtiyê disekine û di derbarê rewşa dawî ya eşîran de jî agahiyan pêşkeş dike. Sernavê beşa pencemîn “Malbat” e. Di vê beşê de, zewac, dawet, malên kurdan, nêzîkatiya kurdan a li hemberî jinê, mezinkirina zarokan û hwd. agahiyên berfireh hatiye dayîn. Beşa şeşemîn, “Demên Vala”, nivîskar hewl dide ku hin çalakiyên demên vala yên kurdan pêşkeş bike. Di vê beşê de gelek agahî derbarê stran, çîrok û çîrokbêjî, cejn, listik, nêcîr û hwd. yên kurdan de hene. Beşa heftemîn bi sernavê “Rojên Reş” derdikeve pêşberî me. Di vê beşê de nivîskar behsa nexweşiyên di nav kurdan de kiriye ka rewşa jiyanê çawa li ser wan bandor dike. Di heman demê de derbarê derman çêkirin û hekîmtiya geleri ya kurdan de jî agahî hene û behsa rîtûelên serxweşî û serdanên goristanan ya kurda jî hatiye kirin. Em beşa heştemîn bi sernavê “Kurd di bin Heyvikê de” dibînin. Di vê beşê de dîroka dinî ya milletê kurd hatiye pêşkeşkirin. Bi mîtraîzm, zerdeştî û misilmantiya kurdan re jiyana kurdan a dinî û herwiha bi derketina medreseyan re xwendina dinî ya kurdan û dinên di nav kurdan de êzîdîtî, kakeyî, ehli heq û hwd. hatine danasîn, di heman demê de, di nav kurdan de derketina tarîqatan û valahiyên ku ew temam kirine jî bi awayekî berfireh nirxandî ye. Di beşa nehemîn de ku bi sernavê “Li Qeraxa Dînî: Xurafe” derdikeve pêşiya me, behsa hin baweriyên bêbinî yên kurdan tê kirin wekî mînak sêhr, baweriyên şaş yên derbarê erdhejê de û hwd. (ji aliyê mît û efsaneyan de dibe ku bibe çavkaniyeke baş). Di vê beşê de nivîskar hewl daye ku bersiva ka kulta pagan hêj jî dijî? dide. Beşa dehemîn bi sernavê “Wêje”yê tê pêşkeşkirin. Di derbarê ziman û wejeya kurdan de him ya nivîskî him jî ya devkî agahiyên berfireh hene. Naverokên wejeyî ya kurdî hatine pêşkeşkirin ji dîroka wejeya kurdî de jî bi çavkaniyan gelek mînak hatine dîtin. Beşa dawî, beşa yanzdemîn jî derbarê neteweperestiya kurdan de ye ku di bin sernavê “Neteweperestiya Kurdan” hatiye nivîsîn. Di vê beşê de jî kokên neteweperestiyê ya kurdan hatiye vekolîn, veguhestina kurdan a ji feodalîzme ya ber bi netewebûnê û herwiha serhildanên neteweyî yên kurdan a çar perçeyan jî hatiye pêşkeşkirin.

2. Ji Aliyê Akademîk ve Pirtûka Kurd

Dema mirov bi hûrgûlî li pirtûkê dinêre mirov dikare bibîne ku Bois ji bo tiştên ku nivisandine piştrast bike hay ji hin tiştan maye. Wekî rojhilatnasek Bois, ligel ku bi sempetiyê mezîn li kurdan nihêriye, gelek caran em dibin şahidê îdealîzasyonekî û darazên teqez³ jî dema pirtûkê nivisandiyê diyar e ku hewl daye li gorî çavkanî, dane û îspatê tevbigere.

Di serî de divê em destnîşan bikin ku hîlbijartina sernavê pirtûkê wekî *Kurd*, li gorî naverokê ku Bois (1966) dema pirtûkê nivîsî ye ji her aliyên Kurdistanê, ji her dîn û mezhebên kurdî mînak, çavdêrî û agahiyan destnîşan kiriye, cihê xwe digire. Dema em li aliyên akademîk yên vê pirtûkê dinêrin hin xal derdikevin pêşberî me. Ji aliyê çavkanî û piştrastkirina darazan ve 4 cure çavkaniyên bingeîn hatin tespîtîkirin. Çavkaniyên yekemîn çavdêriya wî ye. Piştî em dibînin ku Bois di pirtûkê de ji gelek kurdolog û rojhilatnasên wekî B. Nikitin, Minorsky, Viltchusky, Major Soane, Mackenzie jêgirtin û referasan dide. Ev jî ji bo piştrastkirina îdîa, çavdêrî û şîroveyên Bois gelek girîng e. Çavkaniyeke dîtir ya Bois, gerokên wekî Madam Hanson û Madam Chantre in ku nivîskar dem dem serî çavdêriyên wan jî daye. Helbet ew bi xwe jî çavdêriyên bi detay kirine ku em dikarin vê wekî rêbaza çavdêriya bi beşdarî (participants observation) pênase bikin ku li gorî Creswell, J. W. & Creswell, J. D. (2018) ev wekî dîzayneke xebatên etnografîk derdikeve pêşberî me (r.322). Çavkaniya dawî ya nivîskar jî her cure hêmayên folklorîk yên kurdî ne. Tê dîtin ku çavdêrî, tesbît û îdîayên hatine kirin bi taybetî bi gotinên pêşyan û bi gelek mînakên folklorîk hatine piştrastkirin. Herwiha em dibînin ku Bois serî li hin çavkaniyên alîkar jî dane. Kesên wekî Yaşar Kemal (r.60) û Tewfîq Wehbî (r.68) bi nivîsên xwe

3 Wekî mînak di beşa malbatê de, mefhûma namûs û exlaqê de R.43

ji aliyê nivîskar ve wekî çavkaniyên kurd hatine qebûl kirin. Her çiqas navên wan nedabe jî ku em vê dikarin wekî qelsiyeke pirtûkê bibînin, nivîskar jî devê hin niştecihên kurd tespîtan pêşkeş kiriye ev jî wekî çavkanî dikare bê dîtin.

Aliyekî din yê pirtûkê ku ji aliyê akademîk ve pirtûkê xurt dike, pêşkeşkirina dualî ya mijarên binîqaş in. Wekî mînak Bois (1966) dema behsa orijîna kurdan dike ku ev îro jî mijara nîqaşên kûr in, him jî aliyê efsane û mîten di nav gelên din de digere him jî ji aliye dîrok, arkeoloji û antropolojîk ve mijarê nîqaş kiriye (r.9). Di heman demê de tê dîtin ku Bois koka kurdan an jî hebûna kurdan bi delîlên zimanî (linguistic evidence) jî hewl dide ku rave bike (rr.15-16). Her wiha nivîskar hewl dide ku her hêmanên çandî ku bi kurdan ve girêdayî ye bi orjînalên wan ve bide ku ev jî ligel ku pirtûkê ji aliyê bûyîna çavkaniyê ve bihêz dike, asta fêmbariya pirtûkê jî zêde dike. Derfet dide lêkolîner û xwîneran ku zanyariyên di derbarê termînolojiyên kurdî jî zêde bikin.

3. Girîngiya Pirtûkê

Pirtûk jî ber ku ji aliyê rojhilatnasek ve hatiye nivîsîn û li jor me hewl da ku nîrxê wê yê akademîk destnîşan bikin, jî bo beşa kurdolojiyê girîngiyên xwe hene. Dema em li naveroka pirtûkê dinêrin, em dibînin ku Bois, gelek baş çavdêriya jiyana kurdan kiriye. Wekî mînak xanî û konên kurdan bi awayeke berfireh şayesandîye, hin tarîfan di derbarê çekirina pênr û nanê, listina listikan de dane. Herwiha di derbarê pergala civakî a kurdan de, rolên axa û began, jinan û mêran, rîsipî û hwd. ya di civakê de bi awayekî berfireh destnîşan kiriye. Xwîner dema vê pirtûkê bixwînin dikarin di derbarê hemû aliyên kurdan de agahiyên bigirin wekî mînak pirtûk bala xwe bi tenê nade ser piraniyên misilmanên kurd pê re êzîdîyan jî ji bîr nekiriye û di rîtuêl û baweriyên êzîdîyan jî di piraniya beşan de destnîşan kirine (r.34). Di heman demê de, Bois, ji gelek destan, efsane, mît, baweriyên batil; hêmanên folklorîk yê stran, çîrok, gotinên pêşiya, hekîmtiya gel (Hekîmê Kurmancî) mînakên heja dane û danasîna van hêmayan kirine. Kurt û kurmancî Bois di pirtûka xwe de di derbarê çanda madî û manewî ya kurdan de agahiyên berfireh pêşkeş kiriye ev li gorî armanca pirtûkê, ji bo xwîner û lêkolêrên kurdolojiyê vê pirtûkê dike çavkanî.

Du xalên din jî hene ku girîngiya vê pirtûkê nîşan dide. Xala yekem hin tesbîten nivîskar yê di derbarê kurdan de ye ku ev dikare asoya xwîneran di derbarê serdemê de geş bike. Û her wiha xala duyemîn jî hin îdîayên nivîskar hene ku ev jî dikarin bibin mijarên lêkolînê.

Bois di her beşa pirtûkê de, derbarê rewşa nûjen a kurdan de jî (helbet li gorî dema xwe yanî salên 60î) agahiyên dide (r.41). Di vê çarçoveyê de Bois çavdêrî dike ku ji ber belavbûna radyoyê di malan de hin pratîkên çandî yê wekî çîrokbêjiyê kêmbûye. Herwiha çavdêriyeke din jî piştî serdema modern li ser guherîna kirasê aristokrasî ango begtî û mîrtiyê dike. Li gorî Bois (1966, r.25) aristokratên kurd ji bo bandora xwe ya li ser gel biparêze zarokên wan bijîşk û parêzer in di heman demê de balê dikişîne serî ku li Tirkîyê piraniya rojnamevanan bi eslê xwe kurd in.

Destpêka romana kurdî li yekîtiya Sovyetê çêbûye. Bois li ser vê du rexneyan dike ku Kurdên Sovyetê bi awayekî sistematîk hêmanên çandî, wêjeyî û folklorîk li gorî teoriya Soveyetê ji nû ve teşe didin û dinivîsin, ev jî him di wêjeya kurdan de him jî ji bo bandorên siyasî û civakî sînordar dimînin (Bois, 1966, r.121). Her wiha Bois (1966, r.130) tesbît dike ku hêj romaneke rast ya kurdî çênebûye lê belê destan, efsane û hêmanên din ên çandî dikare bike ku romaneke xurt ya kurdî derkeve holê. Bois hin îdîa û tesbîtan kirine ev jî hêjayî xebatên berfireh in. Bois (1966, rr. 92-94) behsa derketina tarîqetan ya li kurdistanê bi taybetî yê qadîr û nexşibendî dike. Herwiha tesbît dike ku ev tarîqet jî hin valahî û tevliheviyên dînî derketine holê û ji ber nexwendabûna kurdan ji xwe re girseyên mezin yê alîgiran peyda kirine. Ji aliyeke din ve tesbît dike ku fablên kurdan de serlehêngê “Rovî” cihê xwe yê mezin heye û ev jî balkêş e. Dîsa li gorî çavdêriyên xwe îdîa dike ku gelek rîtuêlên kurdan ji demên

mîtraîst mane. Wekî dawî dîsa Bois di derbarê Rojhilatê welêt de nîqaşek dike û ev nîqaş li ser pîrsa; Faris û kurd her du jî ne îranî ne? ye. Bois li vir balê dikişîna orîjîn û kokên faris û kurdan û pîrsgirêk û dijîmintiya farisan ya li dijî kurdan, pîrsgirêka kurd ya li dewleta îranî nîqaşeke berfireh dike.

Encam

Di encama vê nirxandinê de em dibînin ku sernavê pirtûkê û sernavên beşan li gorî naveroka pirtûkê ye. Nivîskar her çiqas bi sempatiyek behsa kurdan kiribe jî çavdêriyên xwe bi çavkaniyên din piştrast kirine û di vir de jî serkeftî ye û herwiha mijar bi têgihên diyarkirî rave kirine têgeh bi kurdî jî gotine û di heman demê cihên berfireh jî bo mînakên veqetandine ev jî agahî û zanyariyên ku derbarê kurdan de kirine vekirî û têgihiştbar kirine. Pirtûk li gorî armancên nivîskar di 11 beşan de kurdan bi awayekî pîralî daye nasîn di dawîya pirtûkê de di derbarê karakter û heterojeniyaya kurdan de di mejiyê xwîner de şemayeke baş derdixe. Herwiha gelek hêmayên folklorîk û wêjeyî mînakên dane. Di derbarî bawerî, rîtuêl û baweriyên batil agahiyên berfireh dane. Ji vî aliyê ve pirtûk jî bo xwînerê û lêkolînerên kurdolojiyê him qadeke fireh him jî bi îdîa û tesbîtên xwe qadên lêkolînê jî destnîşan dike. Wekî dawî jî ber ku nivîskar çavkaniyên cur be cur bi kar anî ye, em dibînin ku pirtûk jî aliyê akademîk ve bi çavkanî û jêderên xwe pirtûkekî pêbawer e.

References / Çavkanî

Akin, S. (2013). *Lêkolînên zimannasiya kurdî*. Avesta

Bois, T. (1966). *The kurds*. Published by Khayat Book & Publishing Company S.A.L

Creswell, J. W. & Creswell, J. D. (2018). *Research design qualitative, quantitative, and mixed methods approaches (5th ed.)*. Sage Publications.